

# Name ji bo malbatan

## Mabest şîdeta di nav malbatê de

BIG PRÄVENTION

Dijî şîdeta li nav malbatê – alîkarî ji bo jin û zarokan

"Car caran di laşê dîya min de deqên reş hene. Ewê digot, qaşogiravî lî erdê ketîye. Lê min êvaran dibihîst, çawa, bavê min lî dîya min dixist."

# Malbatên hêja,

Ev gotinê Jamie ye û ji fîlma *"tu jî ewî nas dikî?"* hatîye wergirtin. Ew bi xwe zarokek 12 salî ye. Em ji xwe dipirsin, gelo Jamie çawa li ber wê rewşê rawestîya ye? Ji ber çi dîya wê ji bavê wê cihê nabe, ku ew her roj li dê dixe. Gelo ew bûyera Jamie'yê, bi tenê mînakek e?

Mixabîn rewşa Jamie ne mînakek bi serê xwe ye. Lêkolînek ya Wezareta Malbat, Pîr û Kal û Cîwanan nîşan dide, ku ji çara yek jinek, di jîyana xwe de bi tenê carek be jî, ji alîyê mêrên/hevjîyanê xwe ve bi laşî an jî cinsî rû bî rûyê şîdetê bûye. Nîve nîv ji wan jinan, bi zarokên xwe ve tevayî dijîn/jîyane.

Ev şîdet, di hevjîyanê de % 91 ji alîyê zilaman, hember jinan pêkhatîye. Bi hevokek pisporî, ji wî bûyerê ra, şîdeta li nav malbatê tê gotin. Şîdeta li nav malbatê, bi awayên cure cure derdikeve holê û di nav hemû beşên civatê û kulturê de tê dîtin.

**Awayên şîdeta lî nav malbatê**

- **Şîddeta Laşê**
  Ji ber encama helwestên cure cure, êş peyda dibîn. Wek mînak: Lêdan, xeniqandin, defdana kesekî ji pêlekanan an jî bi firandina tiştekî.
- **Şîdeta Cinsî**
  Pêwîstiya hereketên cinsî, heya destdîrêjkirina tecawûzê.
- **Şîdeta Psîkolojîk**
  Heqaret kirin, çavtirsandin, bi gotinan binpêkirin, tehdît, zarok ji destgirtin, qedexekirin, seredana xizm an jî nasan, di dema ji hev cûdabûnê de şopajotin, bi gotinek dinê stalking (tim û tim acizkirin, bi têlefonê kontrolkirin, bi dizî çavderîkirin).
- **Şîdeta Maddî**
  Hewcedarîya maddî, wek mînak; hevjîyan bi perên xwe ve jîyana jîna xwe birêva dibe û hemû hesaban kontrol dike. Qedexekirina kar û xebata jina xwe.

## Zarok, di bin şîdeta li malbatê de dinalin

*"Ez jî pê dêşîyam, çawa ew li dîya min dixist. Di wî demê de dil û hinavên min hemû dicirifîn." (Sabine, 11 Salî)*

Zarok jî car caran dibînin, çawa bavê wan tiştên xirab tînin serê dîya wan an jî, di nav malê de qîrandin û lawakirina dê tê bihîstin. Ewana, ji bo dîya xwe berxwe dikevin û hewl didin ku dîya xwe ji ber wan êrîşan biparêzin. Zarok, dikevin nav metirsekî mezin, ji bo ewlekarîya xwîşk û birayên xwe û yê xwe. Di nav wî malbatê de, zarok ji alîyê laş û psîkolojîk de jî rû bi rûyê şîdetê dibin.

Zarokên ku rû bi rûyê şîdetê dibin, pirî caran xwe, wek perpirsîyarê şîdeta li malbatê dibînin û li cem wan hissîyeta deyndarîyê peyda dibe û ezîyetê didin laşên xwe. Bawerîya xwe bi xwe naynin, ku li ser bûyerê ku di malê de diqewime, bipeyîvîn. Ji ber ku dikevin nav metirsîyek, ku navê malbatê wê xirab bê bihîstin an jî ji helwestên wan fedî dikin, an jî nikarin peyvek li ser qewimandinê bibînin. Her weha dikevin nav metirsîyek mezin, ku malbat ji hev belav bibe, ger ew li ser "sirrên malbatî" agahdarî bidin. Hissîyeta bê qewatîyê û mijûlbûna li ser şîdeta li malbatê, dikare bibe sedema helwestên balkêş. Wek mînak: Di dibistanê da qelsbûn, helwesta êrîşkarîyê, depresyonê.

**Dîqqat di nav Perwerdekirinê de Şîdet**
Li gor § 1631 BGB, mafên zarokan heye ku bê şîdet bên perwerdekirinê. Pêkve jîyana şîdeta li nav malbatê, dibe sedema birîndarbûna ruhî.

## Şîdet berdewam dike

Tiştên ku li ber çavên wan zarokan diqewimin, ew fêri wana dibin: Ger di nav malbatê de, li navbera dê û bavên wan şîdet pêk hatibe û hember wê şîdetê jî tedbîr nehatibe standinê, zarok ew wek tiştê ne guhertinê dihesibînîn. Ew, şîdetê wek hacêtek bi encam terxan dikin, ku ew li hemberê kesên jar bi dilxwazî çêdibin.

Hin zarok, helwestên êrîşkarîyê nîşan didin û her weha şîdetê bi kartînin, da ku bikaribin ji vê acizîyê (bê hêzîyê) derbikevin. Ev zarokana jî, di dema pêwendîyên xwe yê kamilbûnê de, pirî caran şîdetê bi kar tînin.

Li cem hîn zarokên din jî, ji ber rewşa malbatê pirî caran newêrekî û metirsî derdikeve holê. Wê bê deng bimînin û xwe ji paş ve bikşînin. Di pêwendîyên xwe de jî, meyla serî xarkirinê nîşan didin û rê didin, ku li ser wan şîdetê pêk bînin.

Bi wî awayî, şîdeta li navbera dê û bavan, ne tenê bargiranîyeke rojane li ser zarokên wan derdixe holê. Ew, tesîrekî giran li ser pêwendîyên wan yê ciwanî an jî yê kamilbûnê dike û di hîn pêwîstîyan de jî nifş bi nifş derbas dibe. Mirov dikare pêşî li xeleqa vê şîdetê bigre.

## BIG, karta sor nîşanê şîdeta di nav malbatê dike

Du cure pêşîlêgirtina şîdeta li nav malbatê heye. Cura yekem, tedbîrgirtin e: Zarok, di zûtirîn dem de hîndibin, bi çi awayî bê şîdet pirsgirêk tê çareserkirinê. Bi wî awayî, rê nadin ku di pêşeroja hevjîyana wan de şîdet pêk bê an jî kesek hember wan şîdetê bikar bîne. Cura duwem: Li gor demsalîya zarokan, divê ji wan ra bê îzahkirin. Ew pê agahdar dibin, ku li kî derê û bi çi awayî, ji bo xwe an jî hember şîdeta li nav malbatê, dikarin alîkarîyê werbigrin.

BIG, di karên xwe yê bi zarokan re, wan herdu cureyan bi kar tîne. Di projeya sinifan de: bi navê "şîdet, karta sor dibîne", em zarokan di heft beşên bingehîn de agahdar dikin. Em, curet didin wan, ku di perwerdekirina rojane de, ew tiştana bidin ber çavan.

## Heft beşên bingehîn, pêşîlêgirtina şîdeta li nav malbatê

**Divê xezev hebe!**
Xezev, di pirî caran de wek tiştekî ne baş tê hesibandin. Ji ber ku ew dibe sebeb, helwesteka êrîşkar û rewşeka tevlihev derkeve holê. Hewl bidin, ku bi zarokên xwe re çareyek bibînin, da ku ewana bi xezeva xwe re bi rêva biçin. Da ku tiştek xirab nekin an jî kesek ne êşînin. Ger zarok fêr bibin, xezebê wek hîsek normal qebul bikin û bi awayekî erênî bînin zimên, dibe ku bikaranîna şîdetê kêmtir bibe.

**Di dema niqaşkirinê de, adîlane bin!**
Niqaşkirin û pirsgirêk, di hemû pêwendî û hevaltîyan de derdikeve holê. Lê divê hemû alî, di vê rewşê de adîlane bin; ger usa nebe, yek ji wan wê pê bêşe. Divê hûn zarokên xwe bi hêz bikin, da ku ew jî di dema niqaşan de wî helwestê nîşan bidin (Wek mînak: divê rê bidin ku kesên dinê jî bipeyîvin) Û her weha, stratejîya bê şîdet biceribînin, da ku pirsgirêkan bi hev re çareser bikin.

**Şîdet tu car nayê erênîkirinê!**
Tu caran parastina şîdetê nabe. Mirov nikare bi şîdetê pirsgirêkan safî bike, dijberê wî, ew li ser hesabê kesên din, pirsgirêkan wedişêre. Kesê ku şîdetê bikar tîne, ew bi xwe hember kesên mexdur dibe berpirsîyar.
Ew tê vê babetê ku, di perwerdekirina rojane de şîdetê bikar neynîn, da ku hûn ji bo zarokên xwe bibin mînak. Ger helwesta şîdetê di navbera zarokan de pêk were, pêwîst e hûn têkil bin û hewl bidin ku bi hev re çareserîyek bibînin.

**Şîdeta di navbera dê û bav de, zirar dide zarokan!**
Mezinbûna zarokan di nav rewşeke bi şîdet de, tim zirar e. Ger di pêwendîyên we de îşareta şîdetê hebe, an jî pê bihesin, ku di derûdorên we de şîdeta nav malbatê pêktê, di heman demê de alîkarî werbigrin û şêwirmendan bişêwirin. Her weha girîng e, ku ji zarokan ra jî – li gor demsalên wan – di derheqa şîdeta nav malbatê de agahdarî bê dayîn û ew bizanibin ku li kî derê wê alîkarîyê werbigrin.

**Di şîdeta navbera demsal kamilan de, zarok tu car sucdar nîn in!**
Ger însanek demsal kamil ji zarokek aciz bibe, ew nabe sedem, ku ew hember hevjîyana xwe an jî hember zarokan şîdetê pêk bîne. Ew peyama ji bo zarokan pir girîng e. Ji ber ku ewana xwe wek gunehkar dibînin û wek berpirsîyarîya şîdetê dihesîbînin. Divê zarok ji vê hîssîyeta sûcdarîyê dûr bikevin.

**Divê tiştên xirab, bên aşkera kirin!**
Şîdeta di nav malbatê de, hîn jî, wekî tiştekî nav malbatî tê hesibandin û "aşkerakirina" wî, weke xayîntî tê dîtin. Di bin vê bargiranîyê de zarok, du caran dinalin. Ji bo zarokan pir girîng e, ku fêrbibin, sirrên ku ji wan re dibin bargiranî, dikarin aşkere bikin.

**Mafên zarokan bi alîkarî û pişgirîyê heye!**
Pêhesiyana şîdeta li nav malbatê, ji bo zarokan dibe sedemek bargiranîya mêjîyê û divê ew, ji bo zarokan wek xeterîyek mezin bê hesibandin. Zarokên ku bi wan tiştan rû bi rû dibin, mafên wan heye ku alîkarî û pişgirî bixwazin. Da ku şîdet bi dawî bê.

*"Di roja duwemîn ya projeyê de, helwesta sinifê bi awayekî erênî pêşve çû. Zarok, bi herdu alîyan ve jî ûsîla niqaşê bi bîranîn." (Mamosta birêvebir ya proja "Şîdet, karta sor dibîne!")*

## Lêborîna şîdetê nabe!

Kesên şîdetkar, pirî caran, sedema bikaranîna şîdetê wek “bê hemdên xwe” tînin zimên, qaşogiravî lêborîn dixwazin an jî kesên qurban, wek sucdar nîşan didin. Qaşogiravî qurban bûye sebep, ku ew şîdetê bikar anîye. Berpirsîyara bikar anîna şîdetê û encamên wî, tim ew kes e, ku şîdetê bikar tîne.

## Alîkarî ji bo jinên, ku li nav şîdetê ne

Jinên ku di nav şîdetê de dijîn, bo wan pir dijwar e, ku alîkarî werbigrin. Ew naxwazin, ku malbat ji hev belav bibe an jî li cem wan metirsîyek çêdibe ku wê zarokan winda bikin. Pir jin hen in, ku di nav salan de, fêrî vê rewşê bûne û hêvîya wan ji jîyaneke bê şîdet winda bûye. Hîn jin jî hen in, ku ji alîyê maddî de bi mêrên xwe ve girêdayî ne û nizanin, ku wê bi çi awayî bi tenê rêya xwe serrast bikin. Bi gotinek din, pê nizanin, ku kîjan dezgehên alîkarîyê hen in.

> *“Ez tim di wê bawerîyê de bûm, ku divê pêwendîyên Juri bi bavê xwe re neyê qutkirinê. Ji bo min tişt nuha ronî bûn, ku rewşa malê, çiqas ewî êşandîye. Ger min ew bizaniba..… Min dikarî di zûtirîn dem de alîkarî werbigirtana. ” (Ew gotina dêyek e, ku di nav malbatê de şîdetê dîtîye)*

## Parastina kesek ji malbatê, ku bi şîdetê ra rû bi rû bûye, di heman demê de parastina zarokan e jî

Baştirîn parastina zarokan, wergirtina alîkarîyê ye û her weha rehetbûna kesê ji malbatê ye, ku bi şîdetê ra rû bi rû bûye. Ger hûn zarokek nas bikin, ku di nav şîdeta malbatê de dijî an jî ji jinekî bibhîsin, ku mêr/hevjîyanê wê lêdixe, divê bişêwirin, ku bi çi awayî di wî mînakî de baştirîn alîkarî bikin.

Ger rewş dest dide, bi kesê ku bi şîdetê ra rû bi rû bûye, bipeyîvîn. Agahdarîyên ku we bidest xistîye, bidin dezgehên şêwirdarîyê û alîkarîyê. Dibe ku ew kes, yekcar vê alîkarîyê megire. Ew dikare demeke paşê, ji bo xwe û ji bo zarokên xwe pişgirîyê werbigre. Mirov car caran nikare benda vê demê raweste, wî demê divê kesek ji der ve, têkil bibe. Parastina zarokan, divê tim di qada herî jorîn de cîh bigre.

Xeta telefonê (Hotline) ya BIG, cîhê şêwirdarîyê ji bo jinan, xeta telefonê (Hotline) ya parastina zarokan, Dezgeha Zarokan, her weha dezgehên şêwirdarîyê ji bo zilamên şîdetkar jî, alîkarîya jin, zarok û zilaman dikin, da ku ji bo pêşerojek bê şîdet biçin. Hûn dikarin bi rêya telêfonê, bê ku navê xwe aşkera bikin, ji wan dezgehan gişkan alîkarî werbigrin.

## Cîhên şêwîrdarîyê û Alîkarîyê ji bo şîdeta di nav malbatê de

**BIG Hotline**
Şîdeta li nav malbatê
Alîkarî jî bo jin û zarokan

**Di her saetê de**
Ger pêwîst be, bi pir zimanan
Tel.: 030/6 11 03 00

**Hotline ji bo Parêzîya Zarokan**
Ji bo kesên ku metirsîya zarokan lê heye

**Di her saetê de**
Tel.: 030/61 00 66

**Şêwîrdarî ji bo zilaman, hember şîdetê**
Kursa Şîdeta Sosyalî û şêwîrdarîya kesekî ji bo zilamên şîdetê bikar tine.

Mo.–Fr. 8.00–20.00 Uhr
Tel.: 030/7 85 98 25

## Materyal û tiştên çapkirî, di babeta şîdeta nav malê de:

BIG e.V. (Hg.): Malper ji bo zarokan: www.gewalt-ist-nie-ok.de

BIG e.V. (Hg.): [Ihr Recht bei häuslicher Gewalt – Polizeiliche, strafrechtliche und zivilrechtliche Möglichkeiten des Schutzes, Berlin, 2012] Mafên we, hember li şîdeta nav malbatê – Tedbîrên polîsî, derfetên parastinê yên jî alîyê huqûqa şarwerî û ya cezayê giran, Berlin 2012 (mirov dikare bi pir zimanan peyda bike: Serbî, Xirvatî, Erebî, Spanî, Rusî, Polonî, Tirkî, Îtalî, Vîetnamî, Fransizî, Înglîzî, Almanî, Portekîzî, Taylandî, Kurdî, Farsî) belaş an jî bi tenê heqê postê, an jî ji înternetê bînin xarê www.big-koordinierung.de

Weşanger Wezareta Malbat, Pîr û Kal û Cîwanan: [Mehr Mut zum Reden – Von misshandelten Frauen und ihren Kindern, Berlin, 2013] Ji bo axaftinê hîn pirtir curet – jin û zarokên ku teda dibînin, Berlin, 2013 (Bi Almanî û Tirkî). Dikarin bi belaş ji Broschürenstelle bi dest bixînin. Tel. 0182/722 721 oder www.bmfsfj.de

Cream e.V. (Hg.): Malper bi agahdarî ji bo kesên rû bi rû bûne, www.gewaltschutzinfo.de

Kavemann, Barbara/Kreyssig, Ulrike (Hg.): [Handbuch Kinder und häusliche Gewalt, Verlag für Sozialwissenschaften, Wiesbaden, 2013] Pirtûka destan, zarok û şîdeta nav malê, Verlag für Sozialwissenschaften, Wiesbaden, 2013

Strasser, Philomena: [Kinder legen Zeugnis ab – Gewalt gegen Frauen als Trauma für Kinder, Studienverlag, Innsbruck/Wien/München, 2001] Zarok dev ji qarneyên xwe berdidin – Şîdet hember jinan wek travma ji bo zarokan, Studienverlag, Innsbruck/Wien/München, 2001

Weşanger:
**BIG e.V.**
Dîjî şîdeta li nav malbatê
alîkarî jî bo jîn û zarokan

BIG HOTLINE BIG KOORDINIERUNG BIG PRÄVENTION

BIG e.V.
Durlacherstr. 11a
10715 Berlin
Telefon: 030/841 83 730
Telefax: 030/841 83 731

Weşandin an jî jê wergirtin ya ji Name ji bo Malbatan, tenê bi îcaza BIG e.V. ve pêk tê.

Çapkirina Name ji bo Malbatan, bi alîkarîya Senatsverwaltung für Bildung, Jugend und Wissenschaft pêk hatîye.

Pêkanîn: www.avitamin.de
Çap: onlineprinters GmbH

Berlin, 2015, çapa yekemîn.